

MÎDYA

Hejmar -1-

Sal-1985

KOVARA KOMELA KARKER Û XWÊNDEKARÊN KURD
LI HOLEND A



BAZEWAN
(valkenier)

K.S.A.N

P.b 3001

Arnhem-Holland

www.arsivakurdi.org

pêşgotin

Kovara Mîdya bo cara yekemîn dibin destê hewe daye, ev kovare ji layê komela karker û xwendekarên kurd li Holenda derdikevît, eve yeke ji wan karên ku em pêradibîn.

Hiwîdarîn ku em bikarîn bi rêya vê Kovarê li Ewropa xizmeta gelê xwe bikeyn.

Mîdya wê salê du caran derkevît, mebesta me ji mîdya ewe ku li ser Mêjo, Zarvekirin, Keltor, Stran û Rewşa gelê kurd bi axivît.

Ew tiştên ji bapîran gehîştî destên me, xirvekeyn û bi rengê zanistî binvêsîn.

Herwesa ew tiştên kevnare danî ber destan, eger em bi xwe tiştên gelê xwe neparêzîn, xelk ji me ra na parêzît.

Me divê ew tiştên heta evro didestê me daye, ew ji destên me neçît.

Ûca em daxwazdikeyn ji hemû heval û biraderan, ewên ku dixwazin piştevaniya me biken, ew dikarin ji bo me binvêsînin û rêken, herwesa hûn dikarin hizr û bîrên xwe diyarbiken, da ku kovara Mîdya bi rengê ciwantir bi hêt çapkirinê.

Komîta Kovarê

NAMA YARÊ

Hinêr

Dil bi xeme çî nizane

Nama yarê nehatiye

Yara min çend cwane

Wek surgola vê adarê

Adar xweşe li gel hevala

Sohbet xweşe digel yara

Çavî kilde dusta cwan

Serî şeke b ava golan

Kirasê tenik li ber xweke

Wek horiya l min derkeve

Wexta min dît sewdaser bûm

Lertzika tayê berda leşê min

Hêdî hêdî nêzîk min bû

Bêhna gola li difna min da

Eş û elem li min nema

Poşyê rake li ser çavan

Da bi bînim xala cwan

Çavî radikim weha nîne

Ji kaxeza reş pêve nîne.

P Ê Ş M R G E

Pêşmerge..ev peyva hinda spehî û jêhatî..hinda şeng
û şêrîn ..ev peyva pir bi mêranî azayetî..pir qurbanî
û xwe gorî kirin..pir rastî û duristî, evro ya bûye
stranek xweşawaz li ser zimanê hemû kew û bilbilên
Kurdistanê. Pêşmerge..ewkesin yê ku singên xwe kirin
tan û perjanda ku axa me ya Pîroz bi parêzin, da ku
dagîrker nehên di axa me da, ew kesin yê ku hestiyên
xwe kirin pir da ku gel li ser derbas bibin û biçin
kenarê azadiyê û serbilindiyê..Ew kesên yê ku laş û
bedenê xwe kirin kelem û stirîji bo çavên dijminî..
ew kesin evro xwe kirin komikek pel û agir, da ku dij-
minê me pê bisojît..Pêşmerge Kurdistanê pilingên ne-
bezin, ewên ku partiya me- Partî Dîmoqratî Kurdistan -
perwerde û bi xwedan kirin li ser bîr û bawerên xwe
yê kûr û dûrbîn û piz bi ezmone, û bi nanê şêrînê
kurdîniyê û rastiya û qurbanîyê , heta evro bi rastî
bûyne tîrek pir jehir kirî ji bo singê dijminê me.

B A W E R Î Y A Z E R E D E Ş T Î

Ji mējoyê di hête zanîn ku zerdeşt ji milletên Arî yân kevne, ew yek ji wan zanaya bû yê ku rêya Hasbîna xwedê xebî gelê xwe naskirî. Tête gotin ku Zeredeşt li çerxê heftê li pêş zayîne. Li ser nivêsandina (Mr. Jackson) ewê li ser vê baweriyê rawestîyay, di bêjît:

Ev pêxembere hatîye bawerîya xwe li çerxê berê li bajêrê Ormîyê û herwesa li dewr û berên rûbarê Aras gelê xwe bi xwedê da naskirin. Zeredeştî di genciya xwe da wexta bîst salîyê xwe ji xelkê dîrker û ket di navbera xwe û xwedê da. Di xebata xwe da bawerîya xwe berdeyamkir, belê zelamên bawerîya ayînî bi hemû zanistîya xebat kirin ku Zeredeşt bi ser nekevît, wî jî berê xwe wergêra bi fermana xwedê ber bi Qirlê (Baxiter) û piştî du sala ji xebata wî ya sext, karî bawerîya Qiralî bi kêşit bal xwe. herwesa wezîrê wî (Cambasî) palpiştîya wî kir û keça wî bo xwe îna.

Ew jî pêngavek pir mezin bû ji bo belavkirna ayîna xwe.

Ev bawerîye pêtir mezin bû demê (Wistaspa) bawerî pê înay.

Di çil salîya xwe da dest bi bawerîya xwe kir. Zeredeşt hate koştin di dema şer çêbûy di navbera bawerîya wî û bawerîya gelê (Alhîunî) li ser destê rêveberê Leşkerê Alhîunî (Arcasîp).

Zeredeşt di pîratîya xwe da hat koştin.

Kurte Jiyana

K A M Î R A N B E D I R X A N

Kamîran Bedirxan li roja 21 tebaxê 1895 li bajêrê Îstanbolê hate dinê. Mala Bedirxanî bi nav û denge dinav gelê kurd da, Kamîran ji biçûktîrîn zaroyên Bedirxanî bû, mala Bedirxanî ji binemala mîrên Botanin. Pir caran ji bo azadiya Kurdistanê serokatîya şoreşê dikirin, Kamîran bi xwe li Bêrotê Parêzer bû, ewî bi alîkarîya birayê xwe Celadet kovara HAWAR û RONAHÎ derdixistin.

Demê şerê cîhanê yê dowemîn wan kovara ROJA NU bi zimanê kurdî û firansî derdikir. Piştî hîngê çu Parisê û jinek polonî îna û li wêrê akincî bû. Kamîranî li li zanîngeha Sorbonê dersên zimanê kurdî didan. Sala 1948 ji ber mesela kurdî çu Emrîka. Bedirxanî pir xizmeta Huner û Zimanê kurdî kiriye, ev jî çend pertukên ku wî li ser zimanê kurdî çapkirîn:

-Fehenga Kurdî û Firansî

-Rêzmana Kurdî bi zimanê Firansî

-Wergêrana Qurana pîroz bi zimanê Kurdî, û gelek pertukên din.

Kamîran nuwênerê serok Barzanî bû li Ewropa. sala 1970 çu Kurdistanê Iraqê çavpêkevtin digel serok Barzanî kir.

Li roja 4-1-1979 li Parîs çu ber diloovanîya xwedê.

ÇE EN D G O T I N Ê N P Ê Ş I Y A

- Se be ji gelê xwe be.
- Rasoodûristo Xwahro şkesto.
- Dixom nan û AVê mineta xelkê navê.
- Xwelî bi wî bît ewê pişta xwe bi mirovê aqil girêdet.
- Ez çiya tu çiya golik ma bê giya.
- Çiya bi çiya nakevin belê çav bi çava dikevin.
- Ew xem bila bo wî demî bît.
- Navek giran û gundek wêran .
- Kirmê darê ne ji darê bît zewala darê çî cara nabît.
- Vejana dila bi dana desta diyare.
- Zimanê dirêj bela serê xodanîye.
- Lêhatin ji jêhatinê çêtire.
- Bêş hate ser maldana havêtin ser feqîr û jara.
- Ew sale belê ne ew bihare.
- Agir bi kevîr rêlê wê ter û hişk bi hevra bi sojin.
- Bexê nêr bo ser birînêye.
- Ava xurta seravraz diçît.
- Eger xemxur hebin xem namînin.
- Birîndar dizanîr kîra wî diêşîr.
- Şam şekire welat şêrîn tire.
- Teyrê wîtwîtanî ,te mala xwe xirabkir te yaame jî li ser danî.

-Cutyaro ew çiyê tu diçîninî,gut: demê sînbît tu wê bi bîninî.

-Serê ne bi ser êkve, naçin def êkve.

-Tajî bi zorê nêçîrê naket.

-Fira mirîşkê kadîne.

-Dara azadiyê bi xwînê dihêt avdan.

- \$\$\$\$\$\$\$\$\$\$\$\$\$\$

-Bizna bi şonda bimîninît behra goraye:

Bêgomane hey malê ,yan gundeserkevtin û pêşketina wan diyekâtî û nevgirtinê da ye,li bin tevgêra rêberek zana û dil bi êş û dîsotî xwedî dibîn,ka çewa pez dibîn:çavdêrîya şivanê xwe da tê dicê..evca ev gotin tê gotin dema êk xwe ji kes û karêan xwe dûr bi ket û bi tenê xwe bijît,wê bê gotin(Bizna bi şonda bi mîninît.....).

-Bi mine minê dernakevît ji ber hokmê jinê:

Bêgoman ku mirov daxaza tiştek hêja û berkevtî bi ket divêt xwe mâr xas û çeleng û jêhatî bi ket,netirsinok û bêzirav bît,çunkî bi bê ziravî kes nagehît doza xwe. herwekî Cigerxwîn li parçeyek hozana xwe dibêjît:

Xurta eger tu rabî
Ne wek ser û gorabî
Ne xurt û şehrezabî
Ku bê tac û serabî

Wek başoka here çuk
Tu nastîninî ji min muk
Bokê di dîrî bi totuk
Dê çewa min bikî buk

Belkî divât xwe pêk bînit ji bo gorîkirna doza xwebi mîranî,
hey ne kes bi mine minê dernakevît ji ber hokmê jinê.

~~~~~

HOZANEK BO SERKÊŞÊ MEZIN,

Pêşkêşe : ji bo serokê mezin B A R Z A N Î

-MIZIRÎ-

Ho serkêşo  
Serkêşê karwanê mezin  
Gavanê sê dîn  
Pasewanê darperîn  
Bivra digezin  
Şivanê çeperên  
Mîna singan  
Qet nalerizin  
Zêrevanê axa biha  
Axe ...welê  
Zêr û rezin  
Gemîvanê derya bê bin  
Deray pirî marû nehing  
Ey şareza tirîn rêving  
Serkêşê karwanê mezin  
Girêgirtiyên "Soltanî bû  
Kojtina heyvê  
Bi lezin

Li xwe hişyar be  
Tejî dirêka karwanî da  
Stirî û dizin  
Stirî û hejin  
Ho serkêşo  
Kovan û axînk vekêşo  
Pirî êşo.  
Nîva havînê me sare  
Kanê hetavî!?  
Axa û paşa xwîna me ya kirî pare  
Ma kanê maf?  
Dînar girohê mirovan  
Bi tenê emîn  
Bê lîs û nav  
Nêçîrvan bûyn,  
Em bûyne rav  
Sêwîne em  
Me taye baw  
Serkêşê karwanê mezin  
Gire girtayên bo  
Kojtina heyvê  
Bi lezin  
Li xwe hişyar be  
Tejî dirêka karwaniya da  
Stirî û dizin  
Stirî û dizin.

HO serkêşo  
Dilê dayka me çar kere  
Hêza şevan û tariyê  
Digel me şere  
Sing: Sengere  
Maf: Xencere  
Birîn şemal û fenere  
Xebat : Bab û rêka fere  
Serkêşê karwanê mezin  
Kirêgirtiyên, bo  
Kojtina heyvê  
Bi lezin li xwe hişyar be  
Tejû dirêkade karwanîyada  
Stirî û dizin  
Stirî û dizin.  
XXXXXXXXXX  
Ho serkêşo  
Ho serkêşê babelîşkê  
Siyarê hespê rastîyê  
U serbestîyê  
Siyarê mîna birîşkê  
Peya nebe  
Ronahîya rêya mebe  
Peyman bîtin:  
Em xwe bikî nînan û xwîn, bo..  
Dilê te  
Xwe bikî nînan gole û fîşek, bo..  
Çekê te  
Xwe bikî nînan xencera tîj, bo  
Lepê te  
Xwe bikî nînan ber, bo  
Çeperê te  
Serkêşê karwanê mezin



Gotî Kurdistanim  
Evîndara şieranim  
Xoştivîya we kurdanim  
Ketî me dest neyara.

#####

Ç E N D S T I R A N Ê N D A W E T A

DU MÎHIN DU BIZININ

Du mîhin du bizinin.....herê lêlê herê lo (1)

Du mîhin du bizinin.....heyrano milano (2)

Li govê nasekinin.....(1)

Li govê nasekinin.....(2)

Ew bela serê minin.....(1)

Ew bela serê minin.....(2)

Bo firfira çîçika.....(1)

Bo firfira çîçika.....(2)

Ji hevlêrê ja wanê.....(1)

Ji hevlêrê ta wanê.....(29)

Dilê min derya xema.....(1)

Dilê min derya xema.....(2)

XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX

MÎR ŞEREF

Mîr şeref mîrê me ye.....lêlêLê,lêlêlê(1)

Can şeref mîrê me ye.....heyrano temo lawo(2)

Şîr kêşê babê xwe ye.....(1)

Şîr kêşê babê xwe ye.....(2)

Mîr şerefê hacañî.....(1)  
Te l serî kesrewanî.....(2)  
Serbextê min tu cuwanî.....(1)  
Mîr şerefê ertosê.....(1)  
Te l serî qerepoşî.....(2)

XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX

HAY HAY MEMO

Hay hay memo,eloasî xoş eloasî  
Jaro memo,ebbasî xoş ebbasî  
Hay hay memo,kurtekê l ser kirasî  
Jaro memo,kurtekê l ser kirasî  
Hay hay memo,day kore bû nenyasî  
jaro memo,day kore bû nenyasî  
Hay haymemo,mehîna memo kimêde  
Jaro memo,mehîna memo kimêde  
Hay haymemo,derê qesrê girêde  
Jaro memo,derê qesrê girêde  
Hay hay memo,day kore bû rim lêda  
Jaro memo,day kore bû rim lêda  
Hay hay memo,mehîna memo şemboze  
Jaro memo,mehîna memo şemboze  
Hay hay memo, derê malê kir toze  
Jaro memo, derê malê kir toze  
Hay hay memo,wexera memo pîroze  
Jaro memo,wexera memo pîroze.

XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX

## GUL ŞENÎ

- Gul şênî şênî şênî.....Gul sênîya min mala min(1)  
 Gul şîşeye neşkânî..... (1)  
 Gul şênî cotin cotin.....(1)  
 Serê mila da dgotin.....(1)  
 Gul şênî sêne sêne,,,,,,,,,,,,,(1)  
 Serê mila da dâne.....(1)  
 Gul şênî çarin çarin.....(1)  
 Serê mila da dbarin.....(1)  
 Me xeyal çavêt reşxarin.....(1)

XXXXXXXXXXXXXXXXXX

## LÊ LÊ KÎNÊ

- Lê lê kinê lê lê.....mala minê way way  
 Vî rûbarî lê lê.....hirme hirme way way  
 Digel xwe tînîtlê lê lê.....dar û qurme way way  
 Memkê kinê lê lê.....sêva tirşe way way  
 Lê lê kinê lê lê.....mala minê way way  
 Vî rûbarî lê lê.....hişe hişe way way  
 Digel xwe tînîtlê lê lê.....dar û qirşe way way  
 Memkê kinê lê lê .....sêva xirşe way way  
 Lê lê kinê lê lê.....mala minê way way  
 Vî rûbarî lê lê.....pala nale way way  
 Digel xwe tînîtlê lê lê.....qirş û gale way way  
 Memkê kinê lê lê.....sêva xale way way

XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX



## KURDISTAN

-Ehmedê Nalbend-

Moxabin bo cihê kurda.....Niho lê boye êvarê  
Heta dixewda man.....Serda hat şeva tarê  
Cihê mêra cihê şêra.....Cihê dîndarê û xêra  
Cihê namîs û vêra.....Niho kevtîne bin barê  
Berê evro cîhan gir bûn....Milok û hakim û mîr bûn  
Xodan hikmo çek û şîr bûn..Ji eslê bingehê arê.

#####

## F E N E R

Hozanek...

Xelîlê Dihokê

Cerdevan û kirêgirtiyên bajêrê  
Li şeva tarê  
Xir fenera li torîna min  
Divemirînin..  
Lêva dimêjîn,bersîngê lê dipirtîkînin..  
Lê nizanin  
Min ew lêv yê jehir kirînin..  
Dê pê mirin  
Min tev fener yê helkirînin..  
Ew gorîyê ji erdê digirin..  
Navemirin..Navemirin..

## Ç Î R O K A D I M D I M Î

Xanek rabo ji hizar cotî

Girt û malê xo firotî

Qesta şahê ecem kir

Bi dilê sotî

Xanê kurda wê rabiye

Ji hizar cotî xûndar bûye

Şev û nav daye roviye

Qesta ecemî kirîye

Nik şahê ecem ronîştîye.

Dibêjin demê Xano li welatê xwe bûye xûndar, hindî licem eşîreta gerya kesê nehewand, îna ço cem şahê ecem. Şahî jê-  
ra gut xêrbût çî li te qewmîye?.

Xanoy gut ez li welatê xwe xûndar bûme, hindî ez li cem serokên eşîreta geryam, kesê ez nehewandim, evca min qesta te û xwedê kir. Şahê ecem gutê xano tu rûne xarê li vênê li cem min be hindî ezê saxbim, ez nahêlim bayekê sar bihête ser te ve, xarn û rûniştina te hemî ji dev min, Xanoy demek li dev şahî borand, şahî rojekêgute xanoy: Te ç kar divê ji xwe ra bikey? Xanoy gutê min divêt ez li cem te bim. Şa-  
gutê xano ev hosa naçêbût, divêt tu ji xwe ra karekî bikey.

Îna xanoy gutê: debaşê ez diçim ber pezî û bila korê min Xan ebdal beg biçût ber garana Teterxan beg, biçûk jî bila li malê bin. Şahî gutê Xano bi xwedê tu mirovek bi aqilî, û min gelek tu divêy.

Bersiv bo xelîfey ço, ku divêt ew bi hête diwanê( xelîfe

Wezîrê şahî bû, qewlê xanoy bêşkir, xano çu ber pezî û xan  
ebdal ber gâranê. Heft salên wan bonîn, dibêjin rojekê wesa  
çêbû golkek xelîfey berze bû, xelîfey pirsiyara xan ebdalî  
kir, xan ebdalî gutê min nedîtiye! ya berze bûy, îna xelîfey  
zileyek li xan ebdalî da, xwber gutnê û gut ma hûn hosa  
rêncberiya xelkî dîke? Kerbân xan ebdal begî gelek vebûn  
û çu cem babê xwe;

-Babo!

-Belê korê min te xêre çu çêbûye?

-Babo ez naçim bergaranê.

-Boçî korê min ji ber çî?

-Xelîfey zileyek ya danaye min.

-Debaşe ez jî naçim ber pezî. em hind dîr hatî, hatî vêrê  
û xelkê vêrê em dayn ber zileha, em vê rêncberîyê nakeyn, ez  
dê çim cem şahî û dê perêt xwe wergirî û dê ji vêrê barkî.

Gut çu şeveke xodê daye

Çu rojêke xodê daye

Xano rabo çu nik şahî

Herê şahî herê şahî

Tu lez bike bi lezîne

Mezn û seroka bi cemîne

Tu wan qewla bo me bîne

Em nakîno şivaniyê

Em nakîno gavanîyê

Herê xano tu weneke

Tu wan qewla betal neke

Dilê min û xo jêk neke

Herê şahî herê şahî

Tu lez bike bikelezîne

Mezn û seroka bi cemîne

Tu wan qewla bo me bistîne

Em nakîin şivaniyê

Em nakîin gavanîyê

Rêncberiya ecemiyê.

Hindî ah ma pêve xano razî nebû, xanoy ji xwe negirt bêtî xelîfey zileyek ya dikorê min werandî, ji ber hindê em dê wan qewla betal keyn!.

Xanoy gute şahî; ev heft sale em rêncberê hewe, vêca bese em rêncberîyê nakeyn. Şahî bersiv bo xelîfey firêkir, û xelîfe hate dîwanê, wan qewlê xanoy bêtîkirin û parê xanoy danê. Şahî gutê vêca xano tu dê bo xwe çî kar key?

Xanoy gute şahî eger bi min bêt ez dê xolamînya te li bin vê xîbetê kem, eger te tîstek da md başe û eger te neda bi keyfa te ye?

Şahî gutê: Bi xodê tu mirovek emînî û berkeftîyê, hema tu li bin xîveta min rûne ez dê xercîya te û mala te jî hemîyê dem. Xano ma li bin xîbetê, êvarîyekê du derwêş hatin dîwana şahî, şahî pirs ji wan kir: Gelî derwêşa hûn ji kîrê dihên? Derwêşa gut: em yê ji layê rojhelatî dihên. Şahî gute wan çî heye çî nîne? derwêşa bersiv da:

-Şahê xoş bêt, şêrek yê kevtîye dinav bîşekê da û yê asê bûy, çî kes neşê ji ber wî şêrî diwêrî ra bi hêt û biçît.

Vêca tu paşayê îranîyê, eve me gote te û tu dişay rêkekê jê  
bibî der, eger tu nebî çî kes neşat çî rêka bibetê !.

Şahî jî çavê xwe li dûwanê gêrand, aqlê wî ji kesê nebi-  
rî, îna gut: Xanê kurda te ageh jê hebû?

Xanê gotê belê. Şahî dîdilê xwe da gut, eger Xano li dûv  
vê êminîyê û zelamîniyê hosa yê xoşmêr jî bût, ev mirovê  
hosan bi dest kesê nakevît, şahî gote Xanoy: Rabe eskêrê  
xwe bibe û here belkî tu bikarî çareyekê li wî şêrî bikey.

Şahê dibatê herê Xano

Herê Xano hilo rake eskerane

Here şêrê li nav bîşane

Xanê kurda wê rabîye

Çek û sîleh hilgirtîye

Ebdal begê dabû dîye

Qesta nav bîşî kirîye

Şêrê li wî nirîye

Destê xwe bi metal ve

Didevê şêrî ra kirîye

Destê wî yê kirandîye

Bi destê dî goh lîgirtîye

Ebdal begê lê siyar bîye

Bo şahî bir bi diyarîye

Çavê şahî vê ketîye

Tejî dûmanê kirîye

Bi kojî heywanê kîvîye.



[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)

